Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (241) | NÎSAN / 15-4-2023

# Buhabûna kelûpel û madeyên xwarinê welatiyan dilgiran dike



**Kurdistan**

Li Kurdistana Sûriyê di vê dema dawî de buhayê kelûpel û madeyên sereke yên xwarinê gelekî zêde bûye, û karînên welatiyan yên kirînê jî nînin, herwiha li gelek deveran jî ev made tevî buhabûnê zehmet bidest dikevin, li Kobanê bi hezaran xelk li hêviya bidestxistina madeya şekir in û rastî zehmtiyeke mezin dibin. Welatiyek dibêje, buhabûna kelûpel û madeyêns ereke yên xwarinê bi mebest tê kirin, herwiha çima li navendên bajaran ev made bi zehmet bidest dikeve, ev rêveberî dixwaze xelk mijûl bibin û ji tenê di nanê xwe yê rojane de hizir bikin û ev siyaset ya heman siyaseta rejîma Esed bû.Welatiyekî din jî dibêje, nabe Bazirgan vê rewşê istixlal bikin û kelûpelan buha bikin, ev bazirgan şirîkê desthilata heyî ne, û ew bi hev re vê bazirganiyê dikin ji ber vê yekê pêwîste ev hemû Bazirgan werin sizadan.

# «Rêkar û amadekariyên pêwîst ji bo lidarxistina kongir berdewam in»

**Kurdistan**

Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-S raporta xwe ya siyasî ya meha Adarê belav kiriye û têde wiha ragihandiye, Heta niha arasteya civaka navdewletî ya derbarê krîza Sûriyê rawestiya ye, û hejmareke guhertin rû dan ku ne pêşbînîkirîbûn ji encama erdheja vê dawiyê ku li Tirkiyê û Efrîn li nahiya Cindirêsê li Kurdistana Sûriyê rû da, û bala cîhanê kişand di nav de Neteweyên Yekgirtî, û piştre siza li ser rejîma Sûriyê bi awayekî demkî hatin rakirin, û vê yekê rejîmê ji xwe re wek derfet dît û ji bo berjewendiya xwe ya siyasî û abûrî bikar anî, û pêngav avêtin ji bo normalkirina pêwendiyên xwe ligel hejmareke welatan yên ku destê alîkariyê ji bo xelkê ziyandîtî dirêjkirin, tevî vê yekê jî Netewyên Yekgirtî û Emerîka û Ewropa tekez kirin ku pêwîste kar ji çareseriya siyasî ji krîza Sûriyê re were kirin li gor biryarên navdewletî bi taybet biryara 2254 û lêvegera Cinêv1, Emerîka berdewam tekez dike lis er berdewamiya wê li Îraq û Sûriyê heta ku DAIŞê hebe û dê berdewam piştevaniyê bike, û dê piştgiriya aliyên peywendîdar bike. Derbarê cemsera Astana-Soçî, di dema dawî de gelekî çalak bûye,

> **Normalbûna pêwendiyên Tirkiyê û rejîma Sûriyê zehmet e**

civînên çar alî Rûsiya, Tirkiyê, Îran û rejîma Sûriyê û her yek li gor berjewendiyên xwe tevdigre, û rê bi wan tê dan ku rola xwe di krîza Sûriyê de bibînin, û kar bikin ji bo araste û şêwazên nû ji bo çareseriyê di çarçoveya pêwendiyên navdewletî de yan jî alternatîvek ji çareseriya siyasî re ya ku Neteweyên Yekgirtî û Rojava û Emerîka kar ji bo wê dikin. Rûsiya hewil dide dorpêça ser xwe sivik bike ji encama şerê li Ukraniya , û dixwaze di rêya vî cemserî de biryara navdewletî ji xwe re bikar bîne ji pêkanîna corek ji hevsengiyê ligel Emerîka û Rojava, bi taybet piştî derbasbûna Çînê ji bo deverê di rêya rola wê ya navbênkariyê di navbera Îran û Siûdiyê. Tirkiyê berev hilbijartinên serokomariyê ve diçe, û yek ji mijarên hilbijartinan, pirsa penaberên Sûrî ye, herwiah hewlên Tirkiyê ji bo normalkirina pêwendiyên ligel rejîma Esed gelek astengî li pêş hene û di destpêkê de şert mercên rejîma Esed ya herî giring vekişandina hêzên Tirkiyê ji tevahiya xaka Sûriyê û rawestandina piştevaniya opozîsyona Sûriyê bi herdu baskên xwe yên siyasî û leşkerî, ev yek jî ji bo Tirkiyê zehmet in û ji ber vê yekê rê li ber vê pêngavê tê girtin. Li Kurdistana Sûriyê, roj bo rojê rewş zehmetir dibe, û pêdawistiyên rojane yên xelkê kêm dibin, ji aliyê abûrî ve, bêkarî zêde bûye , û pê re nirxên kelûpelan gelekî buha ye, ev yek jî ligel daketina nirxê lîreya Sûrî berambe diravên biyanî. Ji aliyê sotemeniyê ve , ew jî roj bo rojê nirxê wê zêde dibe, ev yek cihê matmayînê ye ji ber ku devera me devera petrol û xazê ye, û ev yek vê baweriyê dirust dike hinek alî hene bi mebest rewşa xelkê zehmetir dikin di rêya planekê de ku gendelî serkêşiya wê dike.

> **Rewşa xelkê li Kurdistana Sûriyê xerabtir dibe**

Ji aliyê elikitrîk û avê û xizmetguzariyên giştîm berya niha ji bo kehrebeyê bendava Feratê dihate bikar anîn, lê hin pispor dibêjin ku xaza Cibisa bi tenê bes e ji bo kehrebeya tevahiya parêzgeha Hesekê, herwiha av jî pirsgirêk e, û heta niha ev pirsgirêk li bajarê Hesekê heye û gelo heta kengî dê berdewam be û çi careserî ji bo vê pirsgirêkê heye . Li deverên din bi taybet Efrîn û Cindirêsê, ligel berdewamiya derencamên erdhejê û ziyanên canî, cîhan bi wê yekê hişyar b ew jî Tawana şeva Newrozê bû ku li ser destê hejmareke endanên Ehrar El-Şerqiye encamp dan, ku di encamp de 4 welatiyên Kurd şehîd bûn, ev tawan cihê şermezariyê û pêwîste kesên encamder bighên sizayên xwe. Pêwîte ew yek jî bê gotin, ku amadekarç ji bo Kongreya giştî ya PDK-S berdewam in heta ku cih û dema kongreyê were destnîşankirin.

> **Amadekariyên Kongreyê berdewam in**



# Normalkirina pêwendiyên ligel rejîma Esed



**Kurdistan**

Wezîrê Derve yê rejîma Sûriyê Feysel Miqdad piştî zêdetirî ji deh salan, bo cara yekem serdana Siûdiyê dike û bi hevtayê xwe yê Siûdî Feysel Bin Ferhan Al Siûd re civiya. Wezîrê Derve yê Erebistana Siûdî Feysel Bin Ferhan Al Siûd li bajarê Ceddayê pêşwazî li hevtayê xwe yê Sûrî Feysel Miqdad kir û li gorî daxuyaniyeke hevbeş, di civînê de pêkanîna çareseriyekê li Sûriyê ji bo vegera wê bo çarçoveya xwe ya erebî û dîtina çareseriyeke siyasî ku yekitiya Sûriyê biparêze, hatin gotûbêjkirin.

> **Welatên Erebî naxwazin rejîma Esed nêzîkî Tirkiyê bibe**

Daxuyaniya hevbeş tekezî li ser giringiya çareserkirina aloziyên mirovî li Sûriyê û dîtina rêyên guncaw ji bo gihandina alîkariyên mirovî kir. Daxuyaniya Siûdî-Sûrî tekezî li ser piştgiriya dewleta Sûriyê ji bo berfirehkirina kontrola xwe û bidawîkirina hebûna mîlîşyayên çekdar û herwiha xurtkirina hevkariyê di şerê li dijî bazirganiya madeyên hişber de kir.Her wiha her du aliyan behsa gavên pêwîst ji bo dîtina çareseriyeke siyasî ya berfireh ji kirîza Sûriyê re ku dê dawî li hemû encamên wê bîne, lihevhatina niştimanî pêk bîne û bibe alîkar ku Sûriye vegere bo çarçoveya xwe ya erebî, kirin.Her du aliyan her wiha pêşwazî li destpêkirina karên konsulxane û geştên asmanî di navbera Sûriyê û Erebistana Siûdî de kirin.Li hemberê jî, Wezîrê Derve yê Sûriyê pêzanînên xwe ji bo hewlên Erebistana Siûdiyê yên ji bo bidawîanîna kirîza Sûriyê nîşan da û hewlên Erebistana Siûdiyê ji bo gihandina alîkariyên mirovî ji bo ziyandîtiyên erdhejê bilind nirxand. Oman jî pêşwazî li vê yekê kir, û tekez kir ku ew pêşwaziyê li vegera Sûriyê ji bon ava komkara Erebî dike. Di vê derbarê de Desteya danûstandina ya dijberiya Sûriyê, nerazîbûna xwe derbarê asayîkirina peywendiyên sûriyê û welatên Erebî nîşan da, Bedir Camûs serokê desteyê got, ew gav li dijî berjewendiya miletê Sûiyê ye, û gilopa kesik dide Hikûmeta sûriyê ku ji berpirsiyaretiyên xwe bireve. Daxwaz ji welatên Erebî jî dike fişarin zêdetir li ser rejîmê deynin. Hevpeymaniya Niştîmaniya Opozîsyona Sûriyê daxwaz ji Si'ûdye dike li helwesta xwe ya vegerandina peywendiyan digel rejîma Sûriyê vegere. Hevpeymaniya niştîmaniya opozîsyona Sûryê di daxuyanyekê de derbarê seredana Feysel Elmiqdad wezîrê derve yê rejîma Esed jibo Siûdiyê belav kiriye, pêşwazîkirina wezîrê rejîmeke tawanbar ku tawan û komkujî di derheqê miletê xwe de kirine proseya siyasî li Sûryê astengtir dike. Di daxuyaniya Îtîlafê de hatiye jî, rejîma Beşar Esed bi cidî tevlî proseya siyasî li Sûriyê nebûye û bi zanabûn demê wê proseyê direj kir û astengî li ber her gaveke pêşketina wê çêdikir. Îtîlafê belav kiriye, nêzîkatiya digel rejîma Beşar Esed ne bijardeyeke çareserkirina kirîza Sûriyê ye jiber ku piştevaniya wê rejîmê dê wê li ser pêkanîna komkujiyên zêdetir han bide. Di dawiya daxuyaniya xwe de Îtîlafa Niştîmaniya Opozîsyona Sûryê daxwaz ji Si'ûdye kiriye careke din li helwesta xwe vegere, û pabendî helwestên xwe yên bi rûmet bibe. Li ser normalkirina pêwendiyên welatên erebî ligel rejîma Esed di vê dem dawî de rojnameya Kurdistan nerîna hejmareke welatiyan wergirt. Welatiyek dibêje, welatên Erebî û di nav de Siûdiyê ne ji bo çavê Beşar Esed pêwendiyên xwe ligel vî welatî normal dikin, belku ji bo berjewendiyên xwe yên taybet, û ev welat dixwazin Sûriyê ji Îran û Tirkiyê dûr bixin. Welatiyek din dibêje, di vê dema dawî de welatên Erebî zû dikin û roj bi roj pêwendiyên xwe ligel rejîma Esed zêde dikin ew jî heta ku Tirkiyê nêzîkî rejîma Esed nebe, û bi ev yek jî armanca wan ya sereke ye, helbet tevahiya welatên kendavê bi erêkirina Siûdiyê xwe nêzîkî rejîma Esed dikin û ev yek jî piştî sardana Miqdad eşkere bû ku Siûdiyê li pişt hemû planan e, lewma vegere rejîma Esed ji bo nava komkara erebî nêzîk bûye, û vê pêngavê vê rewşa rejîma ji derve hinekî baştir dibe. Welatiyek dibêje, Heta niha welatên Ewropa û Emerîka li dijî normalkirina pêwendiyên welatan ligel rejîma esed, û ew radighînin nabe pêwendî ligel rejîmeke sitemkar werin normalkirin û heta niha jî helwesta wan nehatiye guhertin, lê pirs ew e gelo di pêşerojê de dê helwesta Emerîka wek xwe bimîne yan dê ew jê pêngavên nû bavêje, tiştekî din heye ku bû derfet ev welat pêwendiyên xwe ligel rejîma Esed baş bikin ew jî rûdana Erdheja 6ê meha Sibatê ye ku rejîma Esed wek derfet ji xwe re bikar anî, û hejmareke zêde ya welatan ligel Neteweyên Yekgirtî alîkarî gihandine deverên di jêr destê rejîma Sûriyê û ev yek jî ji bo vê rejîmê baş bû.

> **Rejîmê sûd ji erdheja 6ê Sibatê dît**

# Bargiraniya kesan



Azad Haco Hemê

Wek şopînerekî ji tevgera Kurdî re bi giştî ji mêj ve min şopand û ez dişopînim ku pirr kes hene xwe feriz kirine liser tevgera Kurdî wek barekî zêde û bê kêr di hin ciha dene ew cih ne cihê wane, tevî ku wana rojekê tenê jî tişkî baş an pêşhat ne kirine,, ne rayek û ne nerînek guncaw an bi mifa pêşkêş kirine û ne qezenciyek bi miletê xwere kirine,, tenê wek jimarekê an pirwazekî ku li dîwar dalqandiye ne him û gim, îjar xwezî bivê tenê ba hin jiwan kesan bi zane bûnî tevlî tevgerê bûn,, bûne rêgir û kelem liber pêşketina tevger û endamên wê yên pak û çalak,, nexasim piştî vêketina şoreşa gelê sûrî dijî rêjîma ba's ya sitimkar û şofînî di 2011an de, pirr bûn mîna van kesan li meydana kurdî, hin rêjîmê ew kelefandin û şandin nav tevgerê jibo zanyarîyan nas bikin di riya wan re bê tevgera kurdî çi pîlanan dike û çi nake jibo dozê û doz gihaye û wê bighê kwi û nas bike bê kîj endamên bi tevger û çalake da wan bigirin û bixin zindanê yan wan tune bikin jibo tirsê têxe dilê endam û xelkê û liv û tevgeran wan pûç bike, û hin jî jibo perwezê û perjewendiyên xwenî teng û take kesî hatin nav tevgerê,, ev kesana ji wan re tê gotin kesên bê perensîb û bê şerim, ne xema wan ji dozê ye ku biser keve an, na yan ku miletê wan ji bin destî û sitemê qurtal bin,, tenê xema wan ku pîşeya rêxistin an partîtî liser wan be û xwe li pêş milet paye bikin û xwe bibînin ku ez jî va heme ne wek mirovekî normal û hebûne xwe liser hesabê wan kesên pak û welat parêz feriz û ava dike tevî hin ji wan ne xwendine jî lê xwe zane û şareza dibînin, îro pirr ji van kesanên ku qesta mi liser wane bûne ber pirsiyar û biriyar di destê wan deye ew xelkê û hevalên di qeyimînin, ev rewişa ji hev ketî ya kurdî anha em têde derbas dibin bi dilê wane naxwazin ti guhertin têde çê bibe û tim mîna deshilatê yan serdest çavdêriya hevalên xwe yên pak û paqij û çalak dikin û her dem li wan teng dikin liv û tegera wan di qeyidînin gelek jî ji van welat parêza bûne mexdûr û qurbanî dan bi destê van xiraba, jiber ji van kesên zane û bîrewer ditirsin ku rojekê cihê wan jiwan bistînin yan rojek bê wan muhasebe bikin û bên avêtin,, wek girjiyekê tim dinav bera wan de heye mîna xêrxwaz û şerxwaz, ji lewma bala xwe hûn bidinê ku her dere halê tevgera kurdî bi giştî bi ber paş veye ti pêşhatên nuh an despêşxeriyên xêrê ku dilê miletê xweş û rihet bike tuneye,. Jiber vê tê xwestin ji hemî rêxistin û civakên sivîl û partî û berpiris û serkirdeyên wanî pak ku vê rewişa kampax dêvçûn bikin û li ber çav bigirin lêvegereke cidî û xwendineke baş jêr bikin, wan kes û endamên lawaz û xirab bi paş ve bidin, zana û jîr û xwediyên bawernama bixin cihê biriyarê, wê gavê misoger wê rewiş bi ber guhertinê û başbûniyê ve here û mafên xwe yê rewa û wwendayîemê bi dest xin, ev guman têde tune.

# Romana “Esmanek ji hembêza min hat xwar” belav bû

**Kurdistan**

Vê dawiyê romaneke nû ji aliyê Mahir Hesen , bi navê “Esmenek ji hembêza min hat xwar” hat çapkirin. “ Esmenek ji hembêza min hat xwar” navê romana nû a Mahir Hesen e ku ji aliyê Dar El-Nuxba ve ji bo çap û belav kirinê li Qahîreyê hatiye çapkirin. Ev roman piştî sê berhemên wî yên bi sernavê: “rêwiyên ji bakur” bi erebî û helbesta bi zimanê kurdî bi zaravayê kurmancî bi tîpên latînî “Keniya te” tê. Ji bilî Gotar û lêkolînên li ser Kurdistana Sûriyê bi zimanê erebi û Kurdî çi zaravayên Soranî, Kurmancî û Badînî. Roman ji 150 rûpelan pêk tê û tabluya pirtûkê ji aliyê şêwekara kurd çira Letîf ve hatiye çêkirin. Li jêr kurte gotinên ji romana nû ya Mahir Hesen in: Li ser nivîsara pirtûkê, ciwanekî bêbext di dema kîrza sûrî, ku ew ê tenê çend saetan biçe ser rêya xwe da ku bi evîndara xwe re bi cive , lê bextê wî yê xerab ew hişt ku negihîje wê û gelek salan di girtîgehê de bimîne! Û di dirêjahiya wan salên perîşanî, û tehl û belengaziyê de, wî jiyana xwe bi vî rengî domand, heya ku ji her tiştê hate serê wî û ji jiyana xwe bêzar bû. Li vir em dikarin bibêjin -bê şik- ku mirov di şer de windakirina mirovatiya xwe, bêyî ku bi tevahî têbigihêje, bûye taybetmendiyek bingehîn a mirovan, ku di her rewşê de




têgihîştina wê zehmet e. Careke din, piştî ku heft sal derbas bûn, ew ciwanê dildar lêgerîna hezkiriya xwe temam dike, û dikeve Davek din a çarenûsa a bêrehm û li jiyana wî ya bi êş, rastî gelek zar ên din ku ji aliyê kesên ku bi berdewamî bazirganiya bi darê zorê dikin, hatine zêdekirin. êşa wî bêçare. Di dawiyê de, ew ciwan bi qedera xwe razî dibe ku her dem ew qeder rastî êrişan li ser wî hatiye, û di jiyana xwe de gelek êş kişandiye, û çîrokên di kûrahiya serpêhatiya xwe de vedibêje, ji bo ku zehmetiyên di salên şer de gewr dibin, bête diyarkirin. Rast e, roman di salên şoreşa têkçûyî, dorpêçkirin û piştre şerê xirab de, karîbû xwe weke yek ji afirînerên herî berçav ên nivîsandinê nîşan bide ku karibe bi hûrgilî, bûyer û nivîsandinên rojane vê yekê re berz bibe. qada demê ya herî dijwar, tal, bi êşe û dramatîk, û ji bo ku em karibin bibînin ka çi hevpariya bi sedan e. Romanên ku di deh sal û nîvê jiyana vî şerî de hatine hilberandin, ku li pişt hemû sûc û kuştinan bûn. , revandin, wêrankirin û şewitandina ku bi serê xelkê de hatiye.Lê belê, cudahiya di navbera van berheman de bi şiyana romannivîsê - kî dibe bila bibe - tê ku di vê cîhana zor de, tevî ronahiya hestiyariyê, ezmûn û xeyalê, wekî Nivîskar dikare zêdebûn û taybetmendiyên xwe, di nava vê dîmena afirîner de, belgekirin, xeyalkirin û bi estetîk tomar bike.